

# XEBERDANA ZIMANÊ KURMANCÎ YA MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ

**Tahirhan AYDIN**

Prof. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebîyatê, Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî.  
tahirhan@hotmail.com ORCID ID: <https://orcid.org/0000-0002-2586-2956>

**Article Types / Makale Türü**

Research Article / Gotara Lêkolînê

**Received / Makale Geliş Tarihi**

26.10.2021

**Accepted / Kabul Tarihi**

17/12/2021

<https://doi.org/10.26791/sarkiat.1015235>

## XEBERDANA ZIMANÊ KURMANCÎ YA MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ

### PUXTE

Yek ji berhemên resen ên koleksiyona Aleksandre Jabayî ku em di vê xebatê da *nasandina* wê dikin, *Xeberdana Zimanê Kurmancî* ye ku hin piratîkên axaftina kurmancîyê dihewîne. Berhem ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve di sala 1865an da li Erziromê hatiye nivîsîn. Ev berhema ku bi mebesta hînkirina zaravayê kurdîya kurmancîyê hatiye saz kirin, di derbarê qadên cihê yê jîyanê da pirsyaran û bersivên wan îhtîwa dike. Digel ku ji bo hînkirina kurmancîyê hatiye amadekirin, tê da rêziman tune ye. Pirtûk, ji aliyê Aleksandre Jabayî ve hem hatiye latînîzekirin û hem jî di bin navê “*Dialogues Kurdes*”ê (*Dîyalogên Kurdî*) da hatiye wergêrîn. Destxet ji aliyê fîzîkî ve baş xuya dike, deforme nebûye. Li ser rûpelên vê berhemê, ku bi kurdîya erebîyê hatiye nivîsîn, werger û latînîzekirina Jabayî û notên wî hene. Berhem ji 86 rûpelan, anku ji 43 wereqan pêk tê. Destxetê, hin mijarên wekî silavdayîn, hevnasîn, alîkarî, eşîret, eqreba, zewac, zar û zêç, ajel, temen, danûstandin, tenduristî, ol, sond, navên rojan, navên welatan, hejmar, pere û seyahetê di nava dîyalogan da pêşkêş kirine.

**Peyvên Sereke:** Mela Mehmûdê Bazîdî, Aleksandre Jaba, Kurdî, Kurmancî, Xeberdana Zimanê Kurmancî

## KHEBERDANA ZIMANI KURMANJI OF MELA MAHMOUDI BAZIDI

### ABSTRACT

In this study, we introduce one of the unique works of the Alexandre Jaba collection is titled “Kheberdana Zimani Kurmanji”, which translates as “the practice of speaking Kurmanji language”. The work was written by Mela Mahmudi Bazidi in 1865 in Erzurum. The work, which is designed to teach the Kurmanji dialect of the Kurdish language, contains questions and answers related to different areas of life. Even though it is written to teach Kurmanji, it does not contain any grammatical details. The work was translated into the Latin alphabet by Alexandre Jaba and translated into French by the name “*Dialogues Kurdes*” (Kurdish Dialogues). The work has seemingly no physical defect. The pages of the work in which the Kurdish-Arabic alphabet is used include translations of Jaba and his latinise and study notes. The work consists of 86 pages (or 43 leafs). It covers the topics such as greeting, meeting, cooperation, tribes, relatives, marriage, children, animals, age, shopping, health, religion, oath, days, country names, numbers, money and travel.

**Keywords:** Mela Mahmudi Bazidi, Alexandre Jaba collection, Kurdish, Kurmanji, Kheberdana Zimani Kurmanji

## DESTPÊK

Berîya îcada nivîsê da hînbûn û hînkirina ziman, bi axaftin, bihîstin û teqlîdê pêk dihat. Di dîroka mirovahîyê da piştî demekê nivîs tê îcatkirin û bi saya serê nivîsê agahî di nav insanen da belav dibe. Di vê pêvajoyê da hînbûn û hînkirina zimanan jî ji nivîsê sîd werdigire. Ev pirtûka ku me di vê xebatê da, da nasandin, “*Xeberdana Zimanê Kurmancî*”, berhemeka vê pêvajoyê ye. Em dikarin bibêjin ku hemû berhemên ku di dîroka mirovahîyê da wekî hev bi siûd û bextvekirî nebûne. Hin ji wan wînda bûne mixabin, hin ji wan jî bi rêyekê gihîştine ber destê me.

Çi li ser axa kurdan çi li derveyê axa kurdan, bi hezaran destxetên kurdî hene ku li benda pisporên qadê disekinin. Ev destxet di demeka kurt da û bi hêsanî nehatine amadekirin. Bi hezaran salan, bi têkilîyeka sîstematîk û kronolojîk a di navbera însan, dîrok, civak, ziman, çand, kevneşopî û erdnîgarîyê da peyda bûne. Dema ev têkilî ji hin alîyan ve bê qutkirin mixabin gelek pêşveçûnên ziman û çanda mirovahîyê hema bêje ji nû ve dest pê dikin û mirovahî ji gelek xurtiyên kevnare mehrûm dimîne. Lewra pêşveçûnên zanistî bi awayekî sîstematîk, pêngav pêngav ango tederîcî çê dibin. Ji ber vê yekê di warê çand û zanistê da inqîta û navberdayînên demdirêj ji bo destkeftinên mirovahîyê wekî mirinek tê qebûlkirin. Berevajîyê vê, piştî windabûnêka dîrûdirêj, dema ku di warê çand û zanistê da berhem û hilberên giranbiha tînin dîtin û tesbîtkirin, mirov bi qasî şabûna vejîna mirîyekî kêfxweş dibe.

Bi rastî jî, koleksiyona Aleksandre Jaba ya ku ji berhemên kurdî yê bêmepa pêk hatîye, xezîneyeka gewre ye ku saya serê Jaba û çend fedaîyên serdemekê, îro li ber destê me ye. Xezîneyeka bêmepa ye, lawra wekî eyneya hebûna kurdewarîyê tê da hema bêje ji her alîyên çanda kurdan ve berhemên temsîldar hene: wekî dîrok, ziman, rêziman, helbest, çîrok, ferheng, perwerde, çand, kevneşopî û hwd. Di pêvajoya vê koleksiyonê da, hin berhem hatine amadekirin û wergerandin, hin ji wan hatine istînsaxkirin, hin ji wan jî hatine tesbîtkirin û parastin. Dema em bi giştî li berhemên koleksiyonê dinêrin em dibînin ku Jaba û çend mela û zanayên xwedî hîmnet, giringîyeka mezin dane hînbûn û hînkirina zimanê kurdî. Ji ber ku di wê serdemê da li erdnîgarîya ku Jaba û zanyarên derûdora wî jîyana xwe berdewam dikirin, zaravayê kurmançîyê hakim bû, li ser hîndekekarîya vî zaravayî rawestîyane. Di vê çarçoveyê da çi bi pêşniyaza Jaba û çi jî bi hewldana nivîskaran bixwe, gelek berhemên orîjînal ji bo hînkirina kurmançîyê hatine amadekirin.

Ev berhema bi navê “*Xeberdana Zimanê Kurmancî*” ku em di vê xebatê da nasandina wê dikin, di vê pêvajoyê da ji alîyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatîye nivîsîn û ji alîyê Aleksandre Jaba ve bo Frensî hatîye wergerandin. Em ji çend alîyan ve vê berhemê didin nasandin. Nivîskar wekî berhemên di derheqê hîndekekarîya ziman da, ku rasterast li ser hûngilîyên rêzimanê disekinin amade nekirîye, lê rêbazeka pratîktir pejirandiye. Li gorî vê rêbazê Bazîdî ji gelek sahayên jîyanê mijar hilbijartine û di derheqê wan da pirs û bersiv amade kirine.

Bêgûman wekî hemû berhemên kevin û klasîk ev berhem jî dê ji gelek alîyan ve ronahî bide çanda kurdî û qada kurdolojîyê. Lewra berhemên nivîskî ji gelek alîyên wekî rêziman, hevoksazî, dengnasî, peyvsazî, alfabe û çandê ve agahî dihewînin.

Me di vê xebata kurt da berhemê ji sê alîyan ve da nasandin: nasname, rewşa fîzîkî û naverok.

## 1. XEBERDANA ZIMANÊ KURMANCÎ JI ALÎYÊ NASNAMEYÊ VE

Navê berhemê “*Xeberdana Zimanê Kurmancî*” ye. Ev nav rasterast li ser berga pirtûkê wekî navê berhemê nehatîye nivîsîn, lê li ser rûpela ewil wekî sernavek di forma hevokê da wiha hatîye nivîsîn: “*Xeberdana zimanê kurmançî*”.<sup>1</sup> Îhtîmal e ku ne wekî berhemeka bi rêkûpêk, lê wekî deftereka xebatê û notên dersê hatibe amadekirin. Lewra ne berga pirtûkê hatîye amadekirin, ne navê nivîskar û berhemê li ser bergê heye û ne jî nivîsa destpêk û xatîmeyê heye. Çend berhemên bi vî rengî di koleksiyona Jaba da hene.<sup>2</sup> Li

1 Eger ku peyva kurmançîyê hatibe tewandin mirov dikare wek “*Xeberdana Zimanê Kurmançîyê*” jî bixwîne.

2 Bnr. Mela Mehmûdê Bazîdî, *Qewa ‘îdêd Serfa Kurdî I, II*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd46, Erzirom, 1866); Mela Mehmûdê Bazîdî, *Tuhfetu ‘l-Xullan fî Zimanî Kurdan*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd08, Erzirom, 1866); Mela

ser “*Xeberdana zimanê kurmancî*” tarîxa nivîsandinê û cihê nivîsandinê û navê nivîskar nehatîye nivîsîn. Lê Aleksandre Jaba li ser Frensiya vê berhemê wekî cih Erzirom û wekî tarîx jî 1865 nivîsiye. Digel ku li ser berhemê navê nivîskar nehatîye nivîsîn jî, Rudenko di pirtûka xwe ya bi navê “*Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yên li Lenîngradê*”<sup>3</sup> da, wekî nivîskar “Mela Mamûd Bayezîdî” nivîsiye.

Taybetmendîyeka vê destxetê jî ew e ku Jaba ev berhem hem latînzîze kirîye û hem jî wergera wê ya Frensi amade kirîye. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku her çiqas wekî berhemekê xuya bike jî di nav bergekê da du heb berhem hene. Du defterên ku ebadên wan ji hev cuda ne, bi hev ve hatine zeliqandin. Yek ji wan “*Xeberdana Zimanê Kurmancî*” ye û ya din jî latînzîzekirin û wergera wê ye ku Jaba wekî “*Dialogues Kurdes*”<sup>4</sup> (Dîyalogên Kurdî) bi nav kirîye. Her du berhem jî di koleksiyona Jaba da bi numareya “Kurd 50”yê hatine tomarkirin.

## 2. XEBERDANA ZIMANÊ KURMANCÎ JI ALÎYÊ FÎZÎKÎ VE

Digel ku berhem li ser deftereka ji rêzê hatîye nivîsîn û ne xwedî bergeka birêkûpêk û qewî ye jî dîsa jî rewşa wê ya fîzîkî baş xuya dike. Wisa xuya ye ku piştî hatîye nivîsîn, ji aliyê Jaba ve hewldana hînbûnê li ser hatîye kirin û di pêvajoya berhevkirina koleksiyonê da ev berhem jî wekî yên din li pirtûkxaneyê St. Petersburgê bi cih bûye û li wir hatîye mihefezekirin. Ji aliyê fîzîkî ve jî divê mirov “*Xeberdana Zimanê Kurmancî*” û “*Dialogues Kurdes*”ê ji hev cuda binirxîne.

“*Xeberdana Zimanê Kurmancî*” bi alfabeya kurdî-erebîyê hatîye nivîsîn û xeta rîq‘eyê hatîye bikaranîn. Di navbera rêzîkan da, li çepûrast û jêrûjora rûpelan valahî hatine dayîn lê bi gelemperî di van valahîyan da transkrîpsiyon, werger û notên latîni hene. Her çiqas li hin cihan –muhtemelen- ji şilbûnê, mirekeb belav bûbe jî nivîsên latîni û yên erebî bi hêsanî tên xwendin. Kifş e ku hatîye emilandin lê zêde kevinbûn, belavbûn, qetîn, rizîn û peritîn naxuye. *Xeberdana Zimanê Kurmancî* wekî dîyalogeka kurmancî hatîye amadekirin. Ji ber vê yekê ne menzûm e û ne jî pexşaneka birêkûpêk e. Kaxeza wê spî ye. Li jora rûpelan bi jimareyên erebî hejmarên rûpelan bi mirekeba reş hatine nivîsîn. Hejmara rûpelan bi “1”ê dest pê dike û bi 86an diqede, ango 86 rûpel (43 wereq) in. Nivîs û rûpel ji aliyê rastê ber bi çepê ve hatine saz kirin. Ebadên rûpelên deftera yekem ango ya *Xeberdana Zimanê Kurmancî* 25x19 cm ne. Herweha, di heman rûpelê da ebadên metnê 19x14 cm ne.<sup>5</sup> Hem nivîskar hem jî Jaba di nivîsên xwe da mirekeba reş bi kar anîne. Li ser rûpelan xêz û çarçove tune ne. Di her rûpelê da 12 rêz hene.

Wekî ku li jorî hate gotin di heman dosyayê da hem “*Xeberdana Zimanê Kurmancî*” heye hem jî latînzîzekirin û wergera wê ya bi frensi “*Dialogues Kurdes*” a ji aliyê Aleksandre Jaba ve hatîye kirin, heye. *Dialogues Kurdes*, bi alfabeya latîni wekî pexşan hatîye destnivîsîn. Li gorî *Xeberdana Zimanê Kurmancî* rêzên wê kurstir ango nêzîktir û kesîftir in. Lewra di her rûpelê da 19-29 rêz hene. Belavbûna mirekebê kêmîtir e lê serrastkirinê wê gelek in. Berg û rûpel hindik peritîne. Li jora rûpelan bi jimareyên latîni hejmarên rûpelan bi mirekeba reş hatine nivîsîn. Nivîs û rûpel ji aliyê çepê ber bi rastê ve hatine saz kirin. Ebadên

Mistefa, *Rahênanên Zaimanê Kurdî (Exercices Dela Langue Kurde)*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Akademîya Zanistan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd48, Erzirom, 1860). Me danasîna van her sê berhemên kiribû: Bnr. Tahirhan Aydın, “Sefheî Sibyan a Mela Mehmûdê Bazîdî”, *Nûbihar Akademî*, sal: 5, jimar: 10, (2018), 103-128; Tahirhan Aydın, “Berhemeke Bênav a Mela Mistefa: ‘Rahênanên Zimanê Kurdî’ yan jî ‘Exercices Dela Langue Kurde’”, *Nûbihar Akademî*, sal: 6, jimar: 11, (2019), 145-157; Tahirhan Aydın, “Qewa‘îdê Serfa Kurdî I, II ya Mela Mehmûdê Bazîdî”, *Nûbihar Akademî*, sal: 6, jimar: 12, (2019), 89-98.

3 Bnr. Margarita Borisovna Rudenko, *Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yên li Lenîngradê*, (Çapxaneyê Edebîyata Rojava, Moskova, 1961). (Orjînalê pirtûka Rodenkovê: Руденко Маргарита Борисовна, *Описание курдских рукописей ленинградских собраний*, Издательство Восточной Литературы, Москва, 1961.), 105.

4 Jaba li ser berga wergera xwe wiha nivîsiye: “*Dialogues Entre Deux Kurdes, recueilli et traduits par Auguste Jaba Consul de Russie à Erzerum le 1 Novembre 1865*” (Dîyaloga di navbera du kurdan da, Berhevkar û wergêr: Konsolosê Rusyayê yê li Erziromê, 1 Mijdar 1865). Li vir mebest ji berhevkarîyê çî ye gelo? Sê ihtîmal hene. a) Di amadekirina berhemê da berhevkirina pirs û bersivan. Ev lawaz dixuye. b) Berhevkirina berhemên kurdî di pêvajoya amadekirina koleksiyona xebatên kurdî da. c) Berhevkirina destxeta Bazîdî û ya werger û latînzîzekirina wî ji aliyê Jaba ve.

5 Bnr. Rudenko, *Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yên li Lenîngradê*, 105.

rûpelên vê berhemê 23x18 cm ne. Herweha, di heman rûpelê da ebadên metnê 21x16 cm ne.<sup>6</sup> Jaba di nivîsê da mirekeba reş bi kar anîye. Li ser rûpelan bi qelama resas û bi destan rêz û sitûn hatine xêzkirin.

### 3. XEBERDANA ZIMANÊ KURMANCÎ JI ALÎYÊ NAVEROKÊ VE

*Xeberdana Zimanê Kurmancî*, ji alîyê Bazîdî ve ji bo hînkirina kurmancî hatîye nivîsîn. Rudenko jî di bêje ku ev berhem bi rêya dîyalogan, hînkirina zimanê kurdî ye.<sup>7</sup> Îcar berevajî pirtûkên hîndekarîyê, pirtûk neketîye nav rê û rêbazên rêzimanê û şîroveyan wê. Rasterast wekî axaftina di navbera du kesan da hatîye amadekirin. Berhem qadên jîyanê yê curbicur tîne ziman: silavdayîn, hevnasîn, çûnûhatin, alîkarî, eşîret, eqreba, zewicîn, zarok, ajal, temen, danûstandin, tenduristî, ol, sond, navên rojan, navên welat û dewletan, hejmar, pere, seyahet, xwarin û vexwarin û hwd. Di hevokan da dema niha, dema bê û ya borî hatine bikaranîn. Her çiqas di forma “sual-cewab”ê da hatibe amadekirin jî hin hevokên di bin sualê da ne di forma pirsê da ne. Her wiha carinan di bin sernava sualê da cewab û di bin sernava cewabê da jî sual hatîye pêşkêşkirin.

#### Minak:

Sual: “Ez dê biçime bajêrî.”

Cewab: “Şola te çi ye, tu dê çi bikî?”<sup>8</sup>

Wekî hemû berhemên destxet, divê ev berhem jî, ji gelek alîyan ve bê nirxandin. Lewra di gelek waran da agahîyên giring dihewîne. Mirov dikare ji alîyê mijarên rêzimanê û zimannasîyê yê wekî navdêr, lêker, qertaf, tewang, hemwate, dijwate, zayend, cihnav, rengdêr, rawe, dem, hoker, daçek, gihanek, baneşan, alfabê, dengnasî, peyvsaî, hevoksaî, xalbendî û hwd ve jê îstîfade bike. Digel van mijaran, berhem di derheqê dîrok û çandê da jî agahî dihûndirîne.

### 4. TEWSÎFA DESTXETÊ

1. **Navê berhemê:** *Xeberdana Zimanê Kurmancî / Dialogues Kurdes*
2. **Te’lif, tercume, şerh:** Telif û tercume
3. **Navê nivîskar:** Mela Mehmûdê Bazîdî
4. **Navê mutercim:** Aleksandre Jaba
5. **Cih:** Koleksiyona A. Jaba, The Library of the Russian Academy of Sciences, St. Petersburg, Russia.
6. **Navê Pirtûkxaneyê:** The Library of the Russian Academy of Sciences / Библиотека Российской академии наук, БАН
7. **Pirtûkxane no:** Di dosyaya dijîtal a ku ji Koleksiyona Jaba hatîye girtin da, Kurd 50<sup>9</sup>
8. **Navê xwedî:** Aleksandre Jaba
9. **Zimanê destxetê:** Kurdî (Kurmancî) û Frensî
10. **Taybetîyên bergê:** Kaxeza normal
11. **Serbixwe-mecmû’e:** Serbixwe (berhem û wegera wê)
12. **Cihê telifê:** Erzirom
13. **Tarîxa telifê:** 1865
14. **Cihê tercumeyê:** Erzirom
15. **Tarîxa tercumeyê:** 1865
16. **Menzûm-mensûr:** Mensûr/pexşan
17. **Rengê kaxezê:** Spî

6 Bnr. Rudenko, *Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yê li Lenîngradê*, 105.

7 “Практический разговорник курдского языка в форме диалога.” Bnr. Rudenko, *Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yê li Lenîngradê*, 105.

8 Bnr. Bazîdî, *Xeberdana Zimanê Kurmancî*, 12.

9 Rudenko di berhema xwe da bi rûsî cihê berhemê wiha destnîşan dike: Уп. рук.: Отчет ПБ, 1858, стр. 166; Восточный сборник, стр. 171. Bnr. Rudenko, *Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yê li Lenîngradê*, 104.

18. **Sitûrî û ziravîya kaxezê:** Zirav
19. **Rizîbûna kaxezê:** Nerizîye
20. **Jimara wereqan:** 2 berhem in, her yek ji wan 86 rûpel (43 wereq) e.
21. **Ebadên kaxezê:** *Xeberdana Zimanê Kurmancî:* rûpel ۲۰x۱۹ cm, metin ۱۹x۱۴ cm; *Dialogues Kurdes:* rûpel 23x18 cm, metin 21x16 cm.<sup>10</sup>
22. **Cureya xetê:** *Xeberdana Zimanê Kurmancî:* Rîq'e / *Dialogues Kurdes:* destnivîsa latînî
23. **Mirekeb:** Mirekeba reş
24. **Cedwel:** Çarçoveya metnan tune ye, di rûpelên ku bi tîpên erebî hatine nivîsîn da xêz tune ne lê di yên latînî da ji bo rêzan xêz hatine kişandin.
25. **Jimara sitûnan:** *Xeberdana Zimanê Kurmancî* li ser 1 sitûnê lê *Dialogues Kurdes* li ser 2 sitûnan hatîye saz kirin.
26. **Jimara rêzan:** *Xeberdana Zimanê Kurmancî* 12 rêz ; *Dialogues Kurdes* di navbera 19-29an de.
27. **Sernav:** Ji bilî "Sual" û "Cewab"ê tu sernav tune ne.
28. **Peyva te'qîbê:** Tune ye.
29. **Mutale'e û teshîh:** Werger, latînîzekirin û têbînîyên Jaba gelek in.
30. **Hamiş/derkenar:** Li ser metnên kurdî, têbînî, şîrove, werger û transkrîpsiyonên Jaba yên bi Frensî hene.
31. **Destpêka destxetê:** سوال، روزا وه به خیر
32. **Dawîya destxetê:** خدی خوشی بدت سری حمویان اوه
33. **Naverok:** Ji bo hînkirina hevokên kurdî di mijarên curbicur ên jîyanê da "Sual" u "Cewab"an dihewîne.

10 Bnr. Rudenko, *Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yên li Lenîngradê*, 105.



## ENCAM

Aleksandre Jaba, berhemên kurdî amade kirine, yên heyî berhev kirine, hin ji wan dane istînsaxkirin û hin berhemên nû dane nivîsandin/amadekirin. Yek ji wan berhemên ku di çarçoveya koleksiyonê da cara yekem hatîye amadekirin jî “*Xeberdana Zimanê Kurmancî*” ye. Mirov dikare bibêje ku ev berhem ji bo ku Jaba hînê kurmancîyê bibe hatîye nivîsîn. Jixwe wekî deftereka xebatê hatîye amadekirin. Berhem ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve li Erziromê di sala 1865an da hatîye nivîsîn û ji aliyê Aleksandre Jaba ve hem hatîye latînzekirin / transkîrbekirin û hem bi bal Frensî ve hatîye wergerandin. Ji ber vê yekê di dosyayê da du berhem hene. Yek berhema Bazîdî, yek jî werger û latînzekirina Jaba.

Her çiqas ji bo hînkirina kurmancîyê hatibe nivîsîn jî, wekî berhemên rêzê li ser hûrgilîyên rêzimanê nasekine. Wekî dîyalogekê hatîye amadekirin. Tê da tenê di derheqê aliyên curbicur ên jîyanê da pirs û bersivên wan hene. Berhem îro jî li pirtûkxaneyê St. Petersburgê di koleksiyona Jaba da ye û rewşa wê ya fîzîkî baş xuya dike. Di berhemê da mijarên wekî silavdayîn, hevnasîn, çûnûhatin, alîkarî, eşîret, eqreba, zewicîn, zarok, ajel, temen, danûstandin, tenduristî, ol, sond, navên rojan, navên welat û dewletan, hejmar, pere, seyahet û geştûger, xwarin û vexwarin û hwd hene. Ev berhem jî wekî hemû berhemên di koleksiyonê da ji gelekî alîyan ve ronahîyê dide kurdolojîyê.


## ÇAVKANÎ

- Aydn, Tahirhan, “Sefheî Sibyan a Mela Mehmûdê Bazîdî”, *Nûbihar Akademî*, sal: 5, jimar: 10, (2018), 103-128.
- Aydn, Tahirhan, “Berhemeke Bênav a Mela Mistefa: ‘Rahênanên Zimanê Kurdî’ yan jî ‘Exercices Dela Langue Kurde’”, *Nûbihar Akademî*, sal: 6, jimar: 11, (2019), 145-157.
- Aydn, Tahirhan, “Qewa‘îdêd Serfa Kurdî I, II ya Mela Mehmûdê Bazîdî”, *Nûbihar Akademî*, sal: 6, jimar:12, (2019), 89-98.
- Bazîdî, Mela Mehmûd, *Qewa‘îdêd Serfa Kurdî I, II*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyaya Akademîya Zanîstan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd46, Erzirom, 1866).
- Bazîdî, Mela Mehmûd, *Tuhfetu‘l-Xullan fî Zimanî Kurdan*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyaya Akademîya Zanîstan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd08, Erzirom, 1866).
- Bazîdî, Mela Mehmûd, *Xeberdana Zimanê Kurmancî*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyaya Akademîya Zanîstan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd50, Erzirom, 1865).
- Jaba, Aleksandre, *Catalogue De Manuscrits Kurdes*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyaya Akademîya Zanîstan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd53).
- Jaba, Aleksandre, *Dialogues Kurdes*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyaya Akademîya Zanîstan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd50, Erzirom, 1865).
- Mela Mistefa, *Rahênanên Zaimanê Kurdî / Exercices Dela Langue Kurde*, (Nusxeya dijîtal, Arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyaya Akademîya Zanîstan, St. Petersburg, Rûsya, No: Kurd48, Erzirom, 1860).
- Rudenko, Margarita Borisovna, *Nasandina Koleksiyona Destxetên Kurdî yên li Lenîngradê*, (Çapxaneyaya Edebîyata Rojava, Moskova, 1961.) (Orjînalê pirtûka Rodenko: Руденко Маргарита Борисовна, *Описание курдских рукописей ленинградских собраний*, Издательство Восточной Литературы, Москва, 1961.)




# PÊVEK

## 1. Wereqa pêşî ya Xeberdana Zimanê Kurmancî:




## 2. Wereqa dawî ya Xeberdana Zimanê Kurmancî:






**3. Wereqa pêşî ya Dialogues Kurdes:**



**4. Wereqa dawî ya Dialogues Kurdes:**



## EXTENDED ABSTRACT

Kheberdana Zimani Kurmanji of Mela Mahmoudi Bazidi having served as consul in Erzurum in the second half of the 19th century, Alexandre Jaba (1801-1894) created a collection of Kurdish books with the support of some Kurdish scholars in the region, especially Mela Mahmoudi Bazidi. Most of these books consist of classical manuscripts. To create this valuable collection, Jaba had some of these works copied and had the others copyrighted. Jaba subsequently sent these works to The Library of the Russian Academy of Sciences in St Petersburg (Russia) and had them preserved there. These manuscripts in the collection are the most comprehensive collections in the field of Kurdology. These works, which are unique treasure for Kurdish culture, contain the following subjects: history, language, grammar, poetry, story, culture, dictionary, education and tradition.

Works based on the teaching of Kurdish have an important place in this collection. The work named “Kheberdana Zimani Kurmanji” by Mela Mehmoudi Bazidi, which aims to teach the Kurmanji dialect of Kurdish, is one of the important works in this category. Although the book is based on teaching of Kurmanji, it does not include grammar issues. Bazidi takes a more practical way of teaching than going into grammatical details. He chooses different areas of life, asks questions about these areas and gives answers to these questions.

The name of the manuscript that we are trying to describe in this article is written as “Kheberdana Zimani Kurmanji” on the first page of the book, but not on the cover. The manuscript is reminiscent of a notebook. This stems from the fact that books usually include covers, book titles, authors’ names, preface and afterword information. These standards are not seen in this work. There are a few more works close to this format in the collection.

The book was written in the Kurmanji dialect of Kurdish in Erzurum in 1865. Jaba had both latinized this book of Bazidi and translated it into French. This work of Jaba is also included in Bazidi’s book and both of them are in the same file. Therefore, in this file, there are three different forms of Bazidi’s work. One is the Kurdish version of the work, the other is the latinized version of the Arabic letters, and the third one is the translation of the work into French. Bazidi’s book and Jaba’s two studies on this work are different from each other in terms of size. However, both works are recorded and preserved as a work in the collection with the number “KURD 50”.

The book does not appear to have worn out. It is written in the Kurdish-Arabic alphabet. Pages have margins and line spaces, but these spaces usually contain transcription, translation and notes. Although there are some deformations on the pages, the texts are easily readable. “Kheberdana Zimani Kurmancî” has been prepared as a dialogue book. Therefore, there is neither a verse style, nor a regular prose style. The paper of the notebook is white and the ink is black. Page numbers are written in Arabic numerals at the top of the pages. The pages start with 1, and end with 86. Pages are arranged from right to the left. The dimensions of the first book, “Kheberdana Zimani Kurmanji” are 25x19 cm and the dimensions of the text part of the book are 19x14 cm. Pages have no baselines and no borders. Each page has 12 lines.

As stated in the article, “Kheberdana Zimani Kurmanji” and “Dialogues Kurdes”, the translation of this book by Jaba, are in the same file. Again, we see that Jaba latinized Bazidi’s book and placed it in this file. The lines of this part are more frequent and more numerous. Each page has between 19-29 lines. Baselines and columns are drawn in pencil on the pages. In this file, the deformation of the inks is less, but the corrected faults are more. The cover and pages of the book are less worn-out. Page numbers are written in Latin numerals at the top of the pages. Black ink has been used. The page dimensions of this work are 23x18 cm and the size of the texts on these pages is 21x16 cm.

“Kheberdana Zimani Kurmanji” was written by Bazidi to teach the Kurmancî dialect of Kurdish. In the book, unlike the language teaching books, grammatical details are not included. It is prepared directly in the form of dialogues between two persons. The entire book consists of questions and answers. As a subject, it deals with different areas of life such as greetings, meeting, helping, tribes, relatives, marriage, children,

animals, age issues, shopping, health, religion, swearing, names of days, names of countries, numbers, money, traveling, eating and drinking. The author had used past tense, present tense and future tense in sentences.

As known, ancient manuscripts contribute to the language and culture they belong to in different ways. This book by Bazîdî also sheds light on the Kurdish language and culture in some respects. Therefore, this book can be studied from different aspects, especially in terms of grammar: noun, verb, affixes, inflection, synonym, antonym, gender, pronoun, adjective, phrase, tense, adverb, conjunction, exclamation, alphabet, phonology, morphology, syntax, punctuation and so on.